

Civîna Dihokê ya 69an

Civîna koma Kurmancî ya 69an li bajarê Dihokê di navbera rojên 18 - 24.06.2023yan de li dar ket.

Ev civîn bi alîkarîya Parêzgeha Dihokê û bi piştgirîya parêzerê wê birêz Dr Elî Teter hat pêkanîn. Em gelekî spasî karbidestên demû-dezgeha parêzgehê û parêzgarê wê

kek Dr Elî Teter dikin ji bo alîkarîya wan.

Bi vî awayî, em piştî çend salan careke din bûn mêvanên bajarê xwe Dihoka rengîn, me ciwanî, bedewî û pêşdeçûna wê dît.

Di vî civînê de hevkarên me li ser van

babetan xebitîn: flora û fauna, peyvên nenas û kêmnas, hin peyvên ji hêla Sêwregê û xwarinên devera Behdînan. Ev hevkarên me beşdarî vî civînê bûn:

Rênas Awdal (Zaxo), Mistefa Aydoğan (Mêrdîn), Evîn Bagdu (Waşington), Lezgîne Çalî (Barzan), Newzad


Hirorî (Dihok), Eyûb Kiran (Qerejdax), Qadir Kûtewî (Wan), Mehmûd Lewendî (Qerejdax), Selam Nûman (Qamişlo), Fadil Omer (Dihok), Zinar Soran (Dêrik), Îsmail Şahîn (Sêmel), Reşo Zilan (Agirî).

Encamên vî xebatê li jêrê tîrê pêşkêş kirin.

Xwarinên kevn û nû yên devera Behdînan

Amadekar: Îsmail Şahîn

Nav	Rave û pêkhat	Nav	Rave û pêkhat
Afik, qurtik, medfînî	Xwarina ron ya ku ji ava kelandî û danekî/şinkatîyekî wekî lobîkan, fasolîyan, bamîyan, kulindî û pitatan û ... htd pêk diêt û di gel girarê (savar, birinc, danhêrk) diête xwarin.	Awark	Şorbeya bêrûn ya ku bo xwarina heywanên kehî yan bo mirovan diête çêkirin.
Aqni, avşirînk, êxni	1. Aqni, êxni: Ertoşî. Girara bêafik û kutilkên avşirînkê yê bêtimate. 2. Avşirînk: Berwarî Jorî, Hiror. Kutilkên ji tîkilê hûrkê birincî û goştî diête çêkirin, yê di nav afika nok û hestîyan de diête kelandin. 3. Êxni: Akrê. Afika alînokan ya di gel pîvaz, rûnî, xwê û goştî diête kelandin û di gel birincê/savarê jî diête xwarin. 4. Avşirînk: Zaxo. Kutilkên ji hûrkê birincî û bê tirşatî di gel rûvîkên heşandî diête kelandin. 5. Birinc û goştê tîkde hevîrkirî di gel hestîyên pezî û silqesoran li ser kuçkî diête kelandin. 6. Şorbeya tirş yan jî şirîn ya danhêrkî û ya kulind di nav de. 7. Kutilk yan jî danê qutayî di afika spî (bêtimate) de.	Awarsîr	Awara ku ji şîrî, ardî û avê pêkhatî germ dikin û wek şorbe didin nexweşan.
Ardoşavk, poxîn, arpoşînk	Ardê genim û cehê ferîk yê qelandî dihête moxil kirin û di rûnî de diête qelandin. Mast bi ser de diête kirin yan jî di nav şeker yan jî doşavê (mot, dims) de diête tîkvedan.	Babnelmalk, pitpitok, mernelmalk, balavîk, pîrxenîk	Girara hûrkê savarî piştî hilpifandin, dikelînin. Ev girar zû dikelîlî û ne gelekî birrû (biqedir) e. Behra pitir demê beravê (balav) xelk ji beravê westayî dihatin, ji ber derengwextî û dertengî û negehiştinê ev xwarin çêdikirin. Hindek caran şeva zelumê malê li mal neba, dihatê çêkirin. Hindek caran di ber çêkirinê re cûnedengekî bi ser pitpitê ve jê dihat.
Artûk	Ardîkê tûhişkan yê piştî qutan û hêranê bo xwarinê berdest dibit û zivistanan di nav doşavê de diête tîkvedan û xwarin.	Bacanîk	Bacansorka di rûnî de di gel pîvazê diête qelandin.
Axavk, mirtoxe	Rûn, ard, şeker û xwê ya bo navzîkê kutilkan di nav hev de diête qelandin. Pêştir tîsî (tîrsî) bo jinên zihistanî (zeyîstanî), piştî zarokbûnê dihête pêşkêş kirin da ku bi hêz bibin.	Basîq (bastêq)	Şirînahîyek e ku ji ava kelandî ya tirî, ard û nişayê diête çêkirin. Ew qenc diête kelandin heta baş tîr dibit. Paşê di sênîyekê de diête vala kirin û diête hêlan heta hişkve dibit. Piştê wê pêşkêş dikin û qatqatî li hev dipêçin.
Asîde, lorkesor, qawît	Savar/danhêrk ya ku di nav doşavê de diête kelandin. Di destpêkê de doşav di avê de diête tîkil kirin û germ kirin. Paşê savar/danhêrk bi ser de diête berdan û pêkve diête kelandin heta ku wekî şorbeyeka tîr lê diêt. Paşê rûnê sorkirî lê diête kirin, sarve dibit û pêşkêş dibit bo xwarinê. Pelûka şirînkirî bi doşavê, ard, av, rûn û doşav pêkve diête kelandin. Ar di rûnî de diête sor kirin û doşav bi ser de diête berdan û dimînite li ser agirî heta qenc tîkilî hev dibit.	Befiremast	Befir û mastê di navhev de û tîkilî êk kirî. Li cihên befirîn, gelek caran demê befir dibarît, hindek mastî berdidine ser befirê û tevlihev dikin û dixwin, jê re dibêjnê "befiremast".
Avemast, dewmast, çeqilmast	Têkila avê û mastî ya ku bo vexwarinê diête şilqandin û tîkvedan.	Befirşîr, befreşîr	Befir û şîr ya di nav hev de û tîkilî êk kirî. Li cihên befirîn, gelek caran demê befir dibarît, hindek şîrî berdidine ser befirê û tevlihev dikin û dixwin, jê re dibêjnê "befirşîr".
Avpîvazk, qelîpîvazk	Pîvaz, av û rûnê goştê de. Goştî hûr dikin û dikelînin û tîjî nav pîvaz dikin û filfilan (bîber) dikine nav û tîjî dikin û dixwin. Li hindek cihan pîvazan hûr dikin û di rûnî de diqelînin, ava simaqê berdidine nav û baş dikelînin. Ji nû û hêj agir li bin, piçeka birincî berdidine nav ji bo nişa xwe biditê. Hosa tîkde çendekê dihêline li ser agirî û diînine xwarê û dixwin. Afika bêtimate ya ku pîvaz bi tînê tîde ye.	Beleşek, beleşek	1. Hevîrê ku dirêjkanî wek basoq (bastêq) û seceqan(benî) diête zirav kirin û xirîr kirin, di nav doşavê de diête vedan û li ser agirî diête kelandin û bo xwarinê pêşkêş dibit. Hevîrê wek totikên tenik diête pan kirin û di gel doşavê û li ser agirî diête qelandin, piştî jî doşavê diête derêxistin, dibite nanekî şirîn û diête xwarin. 2. Biha (bîhok) hûrkirî, kelandî û zerkirî (palaftî) ya ku bo xwarinê di nav doşavê diête vedan. Sewikehejîra (hevîrê hêjîran) pirtirtirî û di nav doşavê vedayî ya ku zivistanan bi nanî diête xwarin. Hejîrên di nav doşavê de diête kelandin. Kulindê hişkkirî yê ku zivistanan dikine di doşavê de û dixwin. Sêv, xox, hurmîk, hulîk (alûçe, incas), mewjîjen ku diête hişk kirin û di nav doşavê diête vedan û kelandin. Li cihêkî tezi (sar) û di cerekê de bo xwarinê diête sar kirin. Doşava her fêqîyekê ji bilî ya hejîrê. 3. Kûzîyên (tûjî) gindorî (qawin) yê ku diête spî kirin, li ber hetavê diête hişk kirin û bo zivistanan diête hilgirtin. Li hindek cihan piştî hişkkirinê di nav doşavê diête vedan.
Avtirşîk	Ava tirş ya ava simaqê de ye. Afika kutilkan.	Berrûşîr	Xwarina berrûya şîr (kerik) bi şîrî. Berrûya şîr diête spî kirin û gez (leq) lê diête dan û firra şîrî bi ser de diête kirin.
Awar, lak, pelûk, gevol	Xwarina ku ji ardî û ava germ û rûnê dinavhevde kelandî pêk diêt.	Birûş	Şorbeya ku ji genimê qutayî diête çêkirin.

Nav	Rave û pêkhat	Nav	Rave û pêkhat
Biryani	Girara ku ji dan û goşt û kakilbahîv û xatûnoka (kişmiş) û gelek tiştên di pêk diêt, ku têkde û di êk amanê de diêne kelandin û pêşkêş kirin.	Gêlemast	Têkilê şîrê kelandî û mast. Şîrê kelandî sarve dibit, bi ser mastî de diête berdan û têkvedan. Li hindek cihan doşav jî di nav diête hilkirin û bi nanê qelandî diête xwarin.
Borek	Nan û hevîrê piştî şêlanê (stran) di gel gûza qutayî diête têkil kirin, pan kirin û pirtirt kirin. Di nîva her pirtêkê de ji penîrê hûrkirî û giyayekî zerkirî diête dagirtin. Paşê wek badek (balole, durum) û baloçkan (balole) diête badan û di rûnî de diête sor kirin û bo xwarinê diête pêşkêş kirin.	Girar	Savar /danhêrk/ birinc ya wek dan bo xwarinê diête kelandin û pêşkêş kirin.
Cambergwîzk	Birinca kelandî ya bi nîsk.	Girara bihingedan (bihegdan)	Girara ku hingedan** tède ye, (hindek) goştî û noka jî dikinê.
Çixûs, çilxûs, çerxûs	Xwarina ji nanê req yê hûrkirî û yê ku rûnê sorkirî bi ser de diête berdan pêk diêt. Li nik feleyan, têkilî cehê hêrayî di rûnê sorkirî de û yê ku av bi ser de diête berdan û goşt di nav de diête têkil kirin. Paşê têkde li ser kuçkî diête kelandin, ku bo şanedêrê (festîvalên civakî yên xiristîyanan) diête pêşkêş kirin. Li hindek cihan di demê nankêmahîyê de, girara cehê qelandî û paşê hêrayî û yê ku xelk wekî danhêrkê dikine girar. Cehê ku xelk xwê, dew û avê dikinê û dikin poxîn. Li Berwarî Jorî û Kêsteyê, ceh û genimê xav û bi conî qutayî û yê ku wek girar diête lênan (çêkirin). Li nav Doskîya Jorî, pelûka arê cehî.		
Çîçavk, çîç	Garisê qutayî (hêrayî), piştî ku têkilî piçeka birincî /maşan diête kirin, di rûnî de diête qelandin. Paştir nêzîkî saetekê de avê de (ku divêt av ji danî pitir bit) diête kelandin û wekî nîskê bo xwarinê diête pêşkêş kirin. Li hindek cihan garis di nav dewî de diête kelandin.		** Hingedan, hegdan şeytanteresi (tr) asafoetida (fr) ferula assa-foetida (îng)
Çîçbirinc, pelavçîç	Girara ku ji têkilê garisê zerê (gilgil) qutayî û birincî diête pêşkêş kirin. Garisê qutayî di nav birincî, rûn û avê de diête kelandin.		
Çîçmaş, pelavçîç	Girara ku ji têkilê garisê zerê qutayî û maşan diête pêşkêş kirin. Garisê qutayî di nav maşan (carna di gel hindek birincî jî) diête vedan û di rûnî û avê de diête kelandin.		
Çilbirr(k)	Afika pîvazê û ya bacan û simaqê ya hêk di nav de diête şikandin, ku hemî têkde û di navhev de diêne kelandin. Li hindek cihan pîvaz, hêk û qelî /goşt yên ku di navhev de diêne kelandin.		
1. Çirrik, 2. Şîre	1. Penîrê ji nû şikandî, yê ku hêj nebûye gumtil (girik). Bo xwarinê di nav avelorê (şûjî) de diête kelandin. Penîr zer û çirr dibit, wek xwarin, li ser helaneberan (teht) diête kelandin û pêve pif dibit. 2. Leymûn, şekir û av, yên ku wek xwarin, di nav êk de diêne werkirin û kelandin.	Girargaris	Girara garisê zer. Garisê zer yê bo xwarinê û wek girar di avê de diête kelandin û pêşkêş kirin.
Danhêrk, keliştok	Girara genimê gir yê nekelandî ye ku bo girarê diête hêran.	Girarşîr, teftîşîr, şorbeşîr, şîrbirinc, şorbebirinc	Birincê ku di nav şîrî de diête kelandin. Şorbeya şîrî ya ku birinc / danqut / savar / danhêrk / garis tède ye, ku pitir ji bo nesax û nexweşan diête pêşkêş kirin.
Danqut, danequt, pelqut	Danê genimî yê ku bêî bête kelandin, wek savarî, gir û bi saxî li aşî diête kirin. Sivî û kelpik ji dindikan diête vekirin û wek girar diête lênan û kelandin. Xav û kelandî bi vî navî diête bi nav kirin.	Girrho	Danqutê ku diête bişaftin û wekî girara hişk lê diête kirin, di sênîyeka mezin de diête rû (ro) kirin. Kortek li nîvekê diête, vedan. Ew kort ji dewî diête teji kirin û paşê du sê çemçeyên rûnê pezî bi ser wî dewî de diêne vala kirin û kunciyên qutayî û qelandî dormandor li ser diêne reşandin.
Danquta bimaş	Xwarina ku ji danqut û maşan pêk diêt. Ji rêve (destpêk) dan qut diête nimandin (nermijandin). Paşê pîvaz diête hûr kirin, sor kirin û bi ser danqutî de diête berdan. Dûmahîyê maşên kelandî di nav hildikin û piştî keleka sivik diêtê, wek xwarin pêşkêş dibit.	Givişk, îpraxok, rihik, kiftik, giştik, gilvişk	1. Berwarî Jorî. Hulolok (xilorîk) û gulmiçkên (kemçek, cûm) birincê nimandî û qîmeyê goştî yên ku di navhev de diêne hevîr kirin û kelandin. Binê qazanê bi hestîyan diête veşartin, Birinc û goştê hûrkirî di nav êk de diête hevîr kirin û hulolokên biçûk jê diêne çêkirin. Hestî bi wan hulolokan diête veşartin. Paşê tûxek (qat) ji pirtên bacanreşkan û êk ji hulolokan diête danan heta qazan teji dibit. Rûn û piçeka avê bi ser de diête berdan. Li ser agirî diête danan û dimînt heta dikelit û pêşkêş dibit. Li hindek cihan birincê nimandî û nehevîrkirî, di gel têkilê qîme û pîvaza hûrkirî diête givaştin. Parçeyên dirêjok jê diêne çêkirin. Rêz rêz wek îpraxan di qazanê de li serêk diêne danan. Di afika bacansorkê / ya simaqê de diête kelandin. Gava ji avê hişk dibit, pêşkêş dibit bo xwarinê. 2. Pirtên penîrê meyî, yên ku ji avê diêne givaştin û wek xwarin pêşkêşî zarokan diêne kirin.
Dewîn, meyr(ik), mehîr	Dew û danqut yên ku têkde diêne kelandin.	Gozebez, gwîzebez	Kakilgwîzên hûrkirî, yên ku di nav hingivînê de kelandî û nekelandî de diêne vedan û xwarin. Li hindek cihan hingivîn û kakilgwîz pêkve diêne kelandin û sarve kirin û xwarin.
Doleme	Kutilkên ku ji birincî / tevî savarî û danhêrkê di gel qîmeyê hevîrkirî diêne çêkirin. Di gel kulindzerî (kunderê zer) û di a fika spî de diêne kelandin.	Gulol, gulor	Dewîna birincî. Dew û birincê ku di navêk de diête kelandin, ne wek dewînê ron e, belku hişk e û pitir bi ser girarê ve diçit. Li Zaxoyê dewîn doşav pê diête werkirin. Berwarî Jorî û Kêsteyê dewîna birincî, demê berxbirrê / herrîkêlê bihar û havînan bi rûnê pezî, doşavê yan jî bi hingivînê diête xwarin.
Doşav, dîfs, mêhvet	Ava fêqî (nexasim ya tirî û xurmeyê) ya ku diête / hatîye kelandin, heta ku tîrve dibit.	Gulola govê	Gulola ku li hindek cihan wek edet, zivistanan, demê koçer pezê xwe dikine di govan de, diête çêkirin.
Doşavmast	Mast û doşava tevlihev.	Gurînk gurînde, gulînd	Li Akre, herkî û gulî. Têkilê dewî / mastî û çinîkên nanê tenikê req. Li hindek cihan nanê req diête qetqet kirin û mast / afik bi ser de diête werkirin.
Doşavrûn	Rûnê helandî yê ku doşav bi ser de diête berdan û bi nanî diête xwarin.		
Doxave, doxeba, doxeva, kutildewk	Kutilkên ku ji goşt û birincê pêkve hevîrkirî diêne çêkirin û di nav dewê keşkan de diêne kelandin. Girara ku mast bi ser de diête kirin.		
Firû, firo, firoh	Mastê wî şîrî ye ku hêj zak (zêk) e.		
Garisdewk	Gulola garisî. Garisê zerê qutayî yê ku di nav dewî de diête kelandin. Dew di destpêkê de diête kelandin, paşê garisê qutayî di nav de diête berdan û herdu têkde dikelin heta wek dewîneka piçekê hişk lê diên.		
Gelçe	Têkilê çinîyên nanê req û toza jajîyê (ya binê pîstî) ku avê lê direşînin û dixwin.		

Ji Faunaya Kurdistanê Navên Hinek Heywanan

Amadekar: Eyûb KIRAN



pilo, pilopilo, bêrbêrok, qodqode,
aşaşok, şêrê murîyan, kerro (kurdî)
myrmeleon formicarius (lat.)
karınca aslanı (tr)
grosse fourmi, fourmi-lionne (fr)
antlion (îng)



gayê hirçê, kêzika qoçxezal (kur)
lucanus cervus (lat)
geyikböceği (tr)
lucane cerf-volant (fr)
stag beetle (îng)



kurmê gewdeya kerengan, kurmê qeysika
agapanthia cardui (lat)
longhorn böceği (tr)
agapanthe du chardon f(r)
longhorn beetle (îng)

dûpişkên kurdistanê

dûpişk (kur)	<i>scorpius</i> (lat)	akrep (tr)	scorpion (fr)	scorpion (îng)
dûpişka Kurdistanê (kur)	<i>calchas birulai</i> (lat)	Kürdistan akrebi (tr)	scorpion du Kurdistan	Kurdistan scorpion



dûpişka Mêrdînê (kur)
hottentotta saulcyi (lat)
Mardin akrebi (tr)
scorpion de Mardin (fr)
Mardin Scorpion (îng)



dûpişka dêldirêj (kur)
compsobuthus matthiesseni (lat)
uzun kuyruklu akrep (tr)
scorpion à longue queue (fr)
the buthid scorpion (îng)



dûpişka reş (kur)
androctonus crassicauda (lat)
kara akrep (tr)
scorpion noir à queue large (fr)
the Arabian fat tailed scorpion (îng)



dûpişka zer (kur)
leiurus abdullahbayrami (lat)
sarı akrep (tr)
scorpion jaune (fr)
yellow scorpion (îng)

Guhandar



kerqolan, kerqulan, kerkûvî (kur)
equus hemionus (lat)
Asya yaban eşeği (tr)
âne sauvage d'Asie (fr)
the Asian wild ass (îng)



şivir (kur)
dama dama (lat)
alageyik (tr)
cerf (fr)
the European fallow deer (îng)



xezal (kur)
gazella arabicas (lat)
ceylan (tr)
gazelle (fr)
the gazelle (îng)



kirre, evor (kur)
rupicapra rupicapra (lat)
çengel boynuzlu dağ keçisi (tr)
chamois (fr)
the chamois (îng)



bizinkovî (kur)
capra aegagrus (lat)
dağ keçisi (tr)
bouquetin, chèvre sauvage (fr)
the wild goat, maintain (îng)



pezkovî (kur)
ovis orientalis (gmelinii) anatolica (lat)
anadolu yaban koyunu (tr)
mouton sauvage, mouflon (fr)
the Anatolian wild sheep (îng)

mişkên erd û zevîyan



mişkê erdan (kur)
microtus arvalis (lat)
bayağı tarla sıçanı (tr)
campagnol rat des champs (fr)
the common vole campagnol (îng)



mişkê daran (daristan) (kur)
dryomys nitedula (lat)
orman faresi (tr)
lérotin commun, loir des forêts (fr)
the forest dormouse (îng)

(dûmahî) mişkên erd û zevîyan




mişkê cîloyê (kur)
dryomys pictus (lat)
küçük hasancık (tr)
souris (fr)
forest dormouse (îng)



mişkê avî (kur)
arvicola terrestris (lat)
su sıçanı (tr)
souris aquatique (fr)
the European water vole (îng)



meymûna avî (kur)
myocastor coypus (lat)
su maymunu (tr)
castor (fr)
the nutria, the coypu (îng)




S
xiltê kor yê Mûnzûrê (kur)
nannospalax tuncelicus (lat)
Dersim kör faresi (tr)
taupe du Dersim (fr)
mole rat, mannos palax munzuri (îng)

Nexweşîyên çermî

Amadekar: Fazil OMER

kurdî	tirkî	fransizî	îngilizî
bahînk	gül hastalığı	rosacée	rosacea
balûlk; behlûlk: >>bnr belalûk			
bawesîr: >>bnr bawesîr			
belekî: >>bnr belekî			
bûk; bîk, bûkik	arpacık	orgelet	stye
birîn	yara	plaie, blessure	wound, injury
bîrova hişk	sedef hastalığı	psoriasis	psoriasis
bîrova terr; bîrova şil	eczema	eczéma (purulent)	eczema
bizmarok; kengiroşk, kengirok	topuk dikenî	cor	corn or clavus
çiniçinî	çiçek bozuğu	qui a des marques de petite vérole	pockmarks
dax	yanık izi	cicatrices de brûlure	scar of burn
deq	dövme	tatouage	tattoo
êvîfîn; werimtin; girbûn; hildan, perçifîn: >>bnr werimîn			
germişk: >>bnr germajok			
girêk	tümör	tumeur, nodule	tumor, swelling, node



Wêneyê çermê dabirê

Çend peyv ji hêla Sêwregê

Amadekar: Eyûb KIRAN

kurdî	tirkî	fransizî	îngilizî
argilikî	ateşli/şehvetli kadın	lubrique, nymphomane, qui a le feu au cul	nymphomaniac
argilikî bûn	ateşli olmak, şehvetli olmak (kadınlar için)	être lascive, lubrique, nymphomane	to be a nymphomaniac
bîtik: >>bnr vîtik			
ciq bûn	bıkmak	en avoir assez, en avoir marre, être blasé	to be fed up
ciqbûn	bıkma	ras-le-bol, le fait d'en avoir assez	being fed up
ciq kirin	biktirmek	exaspérer, importuner, pousser à bout	to make somebody feel fed

deşî kirin: <deşî min neke>	birilerini terk etmek	abandonner	to leave somebody, abandon
dêlferac	çatal kuyruklu (kuşlar için)	à queue fourchue (oiseaux)	fork-tailed
dirêtkirin	su içmeye teşvik etmek için çobanların çıkardığı ses	onomatopée lancée par le berger pour faire boire le troupeau	the sound shepherds make to encourage animals to drink water
gulşivan	çoban gülü	anthyllide vulnérable	wound wort, kidney vetch



gulşivan (kur)
Anthyllis vulneria (lat)
çoban gülü (tr)
anthyllide vulnérable (fr)
wound wort, kidney vetch (ing)

Hin peyvên kêmnas – nenas (XV)

Amadekar: Reşo ZÎLAN

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
pincik, pîncik, pîj	bitkilerin yanlarından çıkan ve gelişmesini engelleyen filizler	pousse parasite émergeant des côtés de plantes	sprouts emerging from the sides of plants and preventing their development
cixêlkar	dolandırıcı	escro	scammer
cixêzî	hile, dalavere	escroquerie	trick, scam
pisûnk, pişik, pişilok	karahindiba topuzu	pappus	pappus
dêlik; qalîşk, tehleşîr(k), tehlişk (lat. <i>taraxacum officinale</i>)	karahindiba	pissenlit, dent de lion	dandelion
kût: ko, kul, kuh, kut	kör (kesici aletler için)	émoussé, usé	dull
karmax	iri delikli kalbur	crible, passoire	colander
bêqudoş	uğursuz	sinistre, porte-malheur	ominous, sinister
deneşe, teneşe	ham kaysı	abricot vert	unripe apricot
rişî, gifik, gilovend	püskül	gland (de passementerie)	tassel
peyt: pihêt, pêt, hêl	1. süratli, hızlı, 2. sert	1. rapide, 2. dur	1. fast, 2. hard
hişk, zexim	sıkı	ferme, serré	firm, tight
cihnivêjk, şemilk, sernivêj, dugurd, sucadk	secade	tapis de prière	prayer rug
kislan, keslan	tembel	paresseux	lazy
kend	yamaç	pente	slope
derhûrk, berçîçeçq, berqut: >>bnr taşlık			
pirçilaskî	saç, çimen veya yapraklar için dazlaklaşma / cılızlaşma	dégarni, déplumé, pelé	etiolated
sêwixîn: >>bnr fisirîn			
sîrmo	frenk soğanı	ciboulette	chive
pêqazk	sirken, kaz ayağı	chénopode blanc	goosefoot, chenopodium album
şemlik	renkli ipek başörtüsü	foulard coloré en soie	colorful silk headscarf
eprî	renkli yazma	foulard coloré	colorful headscarf
pûşî	puşi	voile couvrant la tête et le visage	veil
suve ketin; suketin	küsmek, darılmak	être fâché, être en froid avec qn	be offended
sû	taraf	côté	side
sû; sînahî, bînahî	görme gücü	vision, vue	vision
rakilandin: <lê dinê bi hev ketîye û em rakilandin>	sarsmak	ébranler ; secouer	to shake, to quake
xwerd /xwird /xurd: < gur pîr dibe dibe xwerdê kûçikan> / <ji agirê dojhê re bibin xwird û nan>	yem, yiyecek	proie, pitance	prey, food, feed, pittance
qûnmeqes; qisqanck (lat. <i>forficula auricularia</i>)	kulağakaçan	perce-oreille	earwig
merdûx= >>bnr qermox cêwik= cêwîk, cimik, cemik: >>bnr cêwî			
hevalcêwî, hevalcem	ikizlerden her biri	jumeau (un des deux)	one of the twins

sêwik= setik	üçüz	triplet	treling, triplet
xuşrûk: = gijnîjok	ufak dolu	grésil	small hail
kumî, kumê, dombelan	mantar (yenen tipler), dombalan	truffe des sables	mushrooms
kormîk= reşad, dêjnik (lat. <i>lepidium sativum</i>)	tere otu	cresson	garden cress
dirne	nokra sineği kurdu	myiasis, douve du foie	myiasis
dirne kirin	tulum, lastik vb şeyleri yamalamak, yapıştırmak	réparer pneu ou objets en caoutchouc	to patch or repair materials like leather and rubber, etc.
goma kirin	lastikli şeyleri onarmak	réparer avec de la glu	to glue rubber
serqê, xêr	hayır, sadaka	aumône	charity
girmist: gurmist, gulumist: >>bnr mist			
qap: >>bnr borangeh			
malexan: >>bnr kêlindî			
serdanpê: serapa, serepê, seranpê, ji serî hetanî pê	baştan aşağı	de pied en cap	from head to toe
zirze: <zirzeya derî>	kanca, kapı kancası	loquet	hook lock
pêşder: pêşderî, berderî	kapı önü	le pas de porte	door front
berfanî: berfa nerm	yumuşak kar	neige molle	soft snow
taketenê: tikîtenê, tikûtenê	yalnız başına	tout seul	all alone
qol: >>bnr =êzing			
qolkêşan	Yezidi kültüründe şeyh Adi ayini yemeklerinin hazırlanmasında ve pişirilmesinde kullanılacak kütüklerin törensel olarak taşınması	transport cérémoniel des bûches servant à faire cuire des plats destinés à la célébration du culte yézidi du cheikh Adi	ceremonial carrying of logs to be used in preparation and cooking of food for the sheikh Adi feast in yezidi culture
gizre	odun yığını	amas de bûches	woodpile
lûlaq, gilflok, zembelîk, şembelîk, çemçulig, jujî	buz sarkıtı icicles	stalactite	stalactite
kuşkur, keşkul: >>bnr pesarî			
çilxût, cirkêş	didişmeci, tartışmayı didişmeyi seven	querelleur, chicaneur	quarrelsome
pişt kocik: >>bnr > pişt xûz			
firşik, firdoqî, firdik	ekmek, yogurt ve hıyardan yapılan bir yemek	plat à base de pain, yogurt et concombre	dish made of bread, yoghurt drink and cucumber
meyrok, maşot, pepik	tirtil	chenille	caterpillar
beşîle	tohumluk salatalık	variété de concombre dont les pépins servent à planter	type of cucumber kept for its seeds
şeverîx	tohumluk acur	variété de concombre rond dont les pépins servent à planter	type of armenian cucumber kept for its seeds
xîjok, xijoq: >>bnr şemitokî			
xilole, xil	gevşek, sıkışmamış	lâche, laxiste, mal serré	loose, lax, slac



dêlik; qalîşk, tehleşîr(k), tehlişk (kur)
(lat. *taraxacum officinale*)
karahindiba (tr)
pissanlit, dent de lion (fr)
dandelion (îng)



sîrmo (kur)
frenk soğanı (tr)
ciboulette (fr)
chive (îng)



pêqazk (kur)
sirken, kaz ayağı (tr)
chénopode blanc (fr)
goosefoot, chenopodium album (îng)



qûnmeqes; qisqanck (kur)
(lat. *forficula auricularia*)
kulağakaçan (tr)
perce-oreille (fr)
earwig (îng)

KURMANCÎ

MAGAZINE LINGUISTIQUE KURDE, supplément du Bulletin de liaison et d'information
© INSTITUT KURDE DE PARIS, 106, rue La Fayette, 75010 Paris - France, Tel. : 00 33 (0)1 48 24 64 64, www.fikp.org
Directeur de la publication : Reşo ZÎLAN, Réalisation : M. HASSAN